

Zimanê edebiyata zargotinî

(1-2)



Şerefxan Cizîrî

Zimanê Edebiyata Zargotinî;

Zimanê edebiyata nivîsandî û yê edebiyata zargotinî di gelek xalan de ji hevdu cihê dibin. Ew rastiyeke gelekî eşkereye û di gelek waran de jî xwe dide der. Di derbarê zimanê nivîsandî û zimanê zargotinî de antropolog û kulturzanên weke Walter Ong, zimanzanên weke Ferdinand De Saussure û gelek mirovên din xebatên zanyarî kirine. Xebatên wan di hola navnetewî de gelekî dihên niqaşkirin û ew dîtin xwedî rumetên akademîk in. Teorî û metodên wan zanyarî ne. Helbet di wî warî de gelek mirovên din ku bi vê mijarê dadikevin jî hene. Lê ezê dîtinên van zanyarên hanê di vê gotarê de gelekî dubara nekim. Ji ber ku li hinek

deverên din ev dîtin min bi kurtî formûlekirine û min a ge h d a r î l i s e r w a n nivîsandiye...

Diyalektîka ziman;

Li aliyê din di warê ziman, kultur û raman de gelek zanyarê ku li dinyayê bi navûdeng hene lê di welatê me de, ji ber gelek sedeman ew baş yan jî qet nahêne naskirin. Yek ji van zanyarên bi navûdeng Joachim Israel e ku li Swedê profesore sosyolojî ye. Bi navê "Diyalektîka Ziman û Zimanê Diyalektik", profesor Israel xebateke gelek bi ser û bi ber kiriye. Ew pisporeke navdar e û di mijara xwe de otorîte ye. Di vê gotarê xwe de emê hinek dîtinên Israel bi gotinên xwe formûle bikin û emê bixwazîn

hinek dîtinên ku bi kêrî mijara me jî bihên, bi kurtî pêşkêşî xwendevanan bikin.

Mirov dikare dîtinên profesor Israel wilo formûle bike;

Dinyayekî bê ziman û zimanekî bê dinyayê li tu deveran tune, di navbêna dinyayê û ziman de peywendiyek gelek çalak heye, di atmosfereke gerdûnî jî de ev peywendî heye, ji ber ku yê ku vê peywendiyê dihînin rojeve, yê ku li ser gerdûnê xwedî dîtin û bawerî ne, dîsa mirov bi xwe ne. Zimanê ku em li vê derê qal dikin, berî hemû tiştan çalakiyeke mirovî ye. Ji ber wilo ziman û mirov ji hevdu nahêne qetandin. Ewê ku wateyan didin gotinên ziman û naverokan li xwe bar dikin û bi vî awayî jî peywendiyên kulturî lidardixin, dîsa mirov bi xwe ne. Ziman û dinya bêyî hevdu nabin, ma zanyarî, felsefe, edebiyat bê ziman dibe gelo? Ji hevdu qetandina wan herdu çalakiyan di praktîkê de tişteke subjektîf e, ne rast e û têne dikare di xeyalan mirovan de pêk bihê. Peywendiya wan herdu hebûnan pêwistiyeke, ew hebûneke kulturî ye, ew mantiqeke xwedî naveroke û pêwistiyeke zimanî ye. Heger peywendî wilo nehê famkirin, wê gavê ziman wateya xwe

winda dike, bê fonksiyon dimîne û dibe qaçilekî vala.

Tiştêk di vê navê de heye û ev tişt jî divê ji bona mirovan gelekî eşkere be; di destpêka mirovantiye de û di dîroka şaristaniye de pêşî tişt û dîv re jî gotin derketin holê, belê xêr, di destpêkê de berê tişt hebûn û dîv re jî gotin derketin holê. Ji ber ku em baş dizanin ku ziman, tenê tiştên ku hene ji me re dibêje, tiştan pênase dike, navan li tiştan dike. Hebûn dikare madî be, dikare kulturî be, dikare psîkolojîk be, dikare sosyal be û hwd. Li vê derê tişt dihê wateya objeyan, wateya xwezayê, hebûnên sosyal û daneyên rastî. Ji wan dîtinan em dikarin vî encamê derxînin; ziman di navbêna mirovan û dinyayê de rola xwe weke peywendiyeye diyalektîk dileyîze, lihevduhatinên kulturî lidardixîne, kodikên ku wateyên sosyal di wan de tomarkirine diafirîne û dinyaya me dike xwedî wate...

Ziman di gelek waran de carna dibe mirovî û carna dibe dinyayî, cîhê xwe her gav diguhere, çalak e û ne di cîhê xwe de cemîdiye, ango herdu hebûn, ango mirov û dinya, bi alîkariya zimên dighêjin hevdu. Hevdu hembêz dikin. Ew bêyî hevdu nabin û bi

hevdu re û bi alîkariya hevdu realîze dibin.

Dîsa, divê mirov baş zanibe ku zanîn bêyî ziman, beyî ku bê gotin, beyî ku bihê formûlekirin, bêyî ku bê nivîsandin, nikare bibe xwediye wateyeke civatî. Ji bona ku mirov karibe zimanê xwe bi karbine, çî nivîskî be û çî zargotinî be, divê mirov ji hindek aliyan de jêhatî be. Mirov divê tekûz be. Di warê normên peywendiyê de, normên ku civatan dike civat, divê mirov di van waran de baş jêhatîbe. Ango mirov karibe bi haweyekî ku hatiye pejirandin binivîsîne, bi axive, xwe formûle bike û danûstandinekê piralî lidarxîne. Jêhatbûn hem di warê psîkolojîk de divê hebe û hem jî warê gewdeyî de divê hebe.

Jêhatîbûna mirovan di vê kontekstê de ne bi wateya gramatîk yan jî bi normên mantiqekê ku formelin divê bihê têgehijtin. Lê jêhatîbûn ewê ku mirov di nivîsandinê de yan jî di gotina xwe de nekeve nakokiyên, nekeve koncalan, yan jî tiştên bêwate ji mirovan re nebêje. Ango mirov çî cara nikare bi zimanê şildim bildim bi axive, binivîsîne û dîtinên xwe formûle bike. Ji ber ku zimanê şildim bildim, ji mirovan re zimanekî bêwate ye.

Di vê peywendiyê mirovî de divê kes tazî dernekevin miqabilî civatê, ji ber ku civat di rûhê xwe de, di hebûna xwe de mirovê têkûz kirî dixwaze. Tekûzbûn ne di derbara formalîta ziman de ye, lê di derbara naveroka ziman û kodên kulturî de ye. Ji bona mînak em dikarin wilo bibêjin; ma mirov dikare ji çêlekê re bibêje hesp? Ji xalê xwe re bibêje apo? Ji hejîreke alikî re bibêje kerikî ye? Ji çiyayekî re bibêje berî ye? Û hwd... Yê ku wateyan didin gotinan, lihevduhatînin mirovan in, binavkirinên tiştan in, avakirinên îşaretan in û ev yeka hanê jî xebateke kolektîv e. Ziman bêyî kolektîvîte nikare pêş ve biçê û bibe zimanê danûstandinê. Yê ku wate li gotinan bar dike kolektîvîte ye, ne kes in.

Bi kurtî ziman lihevduhatînin civatî derdixe pêş û wan dike bingeh ji bona danûstandinên mirovî di civatê de...

Emê nûha jî dîtinên pisporê xwe li vê derê bihêlin û careke din wegerin ser mijara xwe:

Zimanê edebiyata nivîsandî û ya edebiyata zargotinî;

Di warê zimanê nivîsandî û zimanê zargotinî û cûdayiyên di navbêna wan de, kelepuweke

dewlemend heye. Ew kelepûr bi qasî hebûna dinyayê dewlemend e. Xalên cûdayiyê di navbêna wan herdu babetê edebiyatê de li gora armancên mirovan dikarin gelekbin yan jî hindikbin. Heger armanca mirovan tevahî be, wê gavê cûdabûn jî berfireh dibin. Na, heger armanca mirovan bi taybetî be, wê gavê cûdabûn biçûk dibin û bi kurtî û bi asanî jî ev cûdayî dikarin bihêne formûlekirin. Her çiqase ev herdu babetê edebiyat û ziman ne ji hevdu qetyayî bin jî, dîsa rastiya van babetên edebiyatê û zimanan ne weke hevdu ye.

Zîmanê edebiyata nivîsandî xwediyê formalîte û zanebûnên zanyarî ye. Hilbet babetên vê formalîtê û zanebûnên zanyarî jî li gora armancên mirovan dikarin teng bibin yan jî dikarin fireh bibin...

Li paş vî zimanê nivîsandî û xwedî sazî, dewlemendiyeke akademîk heye, lêkolînên fireh û teoriyên kûr hene. Ji gelek aliyên de ew ziman rasterasta bi realîta civatê re ne, di navbêna peywendiyek piralî û berbiçav de ye, lê ew li gora derdora xwe ya teng û daxwaziyên ku xwediyê vî zimanê dane ser milê xwe, pêş

ve diçe. Mirov dikare bibêje ku ew ziman, zimanê ser masê ye û yê saziyên fermî ye. Ew zimanê mekanên girtî ye, di nava komikên perwerdekirî dihê bikaranîn û di warên teng de derfetên pêşketîna xwe dibîne.

Warên teng bi wextê re dibin mekanên fireh di civatê de, weke gelek tiştan, ev jî tişteki gelekî aşkere ye. Bi fermîkirina vî zimanê re warên bikaranîna vî zimanê jî zêde dibin, gelek mirov dikevin bandora wîna û hêdî hêdî cîh li zimanê xelkê jî teng dibe. Bandora dewletê li ser civatê çiqasî fireh be, sosyalîsazyona mirovan çiqasî kûr û berfireh be, ew ziman jî bandora xwe li ser xelkê ewqasî fireh dike. Ji ber ku ev babetê ziman beriya hemû tiştî, bi alîkariya saziyên dewletê pêş dikeve û dûra jî li nava civatê belav dibe û berfirehtir dibe.

Ew ziman bêtir akademîk e, zimanê mirovên neqandî ye, biyanîbûyî ye, dewletî ye û dogmatîk e. Ji hêla kes û dezgehên akademîk ve ew ziman dihê formûlekirin û dûra berê xwe dida nava civata ku wîna xwedî dike. Ango zimanê edebiyata nivîsandî ji jor de berbê jêr de diçe û ji aliyê xelkê ve bi berxwedan dihê

himbêzkerin. Li miqabilî vî zimanê ku ji rastiye dûr e, her gav di civatan de berxwedan heye. Ew babetê ziman ji serê girê civatê dadikeve nava binê civatê, ne ku ji nava civatê berbi jor de diçe! Berepaş dimeşe û paşûpê li hespa xwe siwar dibe! Ji ber norm û gramatika xwe ya formel, ji bona gotinên xwe yên çêkirî û ji rastiye dûr, ev ziman hinekî zêde otorîter dibe û di civatan de jî dibe zimanê serdestan.

Di gelek waran de bikaranîn û avaniya vî zimanî ji aliyên kesên ku xwediyê perwerdebûneke çarçikîne û ji rastiya xelkê hinekî dûrin, dihê pêşkêşîkirin û di saziyên wana de ew ziman dihê bilindkirin. Heta mirov dikare bibêje ku ev zimanê akademîk dikare ji rastiya xwe gelek caran dûr bikeve û bibe zimanekî di ziman de. Dikare bibe zimanekî otonom. Ji bona minak; gelek zimanên pişeyî, ayîndeyî û hiqûqî wilo ne, tenê kesê ku di vî warî de baş perwerdebûne van zimanan dikarin baş famdikin. Ji kesên din re ev ziman dibe weke sênceke sosyal û li miqabilî hemwelatîyan radiweste. Ango ew heta pileyekî dibe

zimanekî ku rastiya civatî û dîrokî dinûxûmîne, li gora xwe şîrove dike, dûra dibe perdeyeke kulturî dinavbêna mirovan û rastiya civatî de. Bi gelek haweyan ew ziman alikariyan serdestan dike, ji bona ku desthilatdariya xwe bi hêsanî karibin bidomînin...

Helbet li ser vî zimanê hanê mirov dikare gelek tiştên baş jî bibêje;

1) Weke tovbûna ku di vî zimanî de heye; ew tovbûn dibe alîkar ji bona ku mirov karibe hinek rastiye kûr jî îfade bike. Weke rastiye psîkolojî û bêhişmendî, weke daneyên ekonomiyek bilind û rastiye astronomî.

2) Dewlemendiya ku di vî zimanî de heye; ji bona ku mirov karibe di gelek waran de zimanekî zanyarî bi kar bihîne û rewşên cihê cihê bikaribe analîz bike, ew ziman gelek caran pêwîste.

3) Rast bikaranîna ziman di warê cihê cihê de; wexta ku ziman têra xwe ne dewlemend û fireh be, rast neyê bikaranîn, wê gavê mirov wê nikaribe bi hêsanî gotinên ku bersîva rastiye cûrbecûr bidin, bibîne, rastî jî wê gavê dikare yekalî bibe û ji rastiya xwe ya berfireh û kûr dûr bikeve, anga hest û ramanên mirovan yên kûr,

dikarin wê gavê di tarîtiyê de bimînin û hwd...

Em hemû baş dizanin ku ev ziman alîkariya zanîn û zanyariye jî dike.

Rexna ku min li jor girtiye, ne li ser hewcedariya yan jî nehewcedariya wî zimanî ye, lê ew rexne û balkişandin li ser zimanê ku ji realîta xwe dûr ketiye û bi serê xwe bûye hebûneke li derveyî civatê, yan ji di dawî de bûye zimanekî komikên biçûk û ji civatê îzole bûye. Ew zimanê hanê, zimanekî çêkirî ye, abstrakte, ji rastî û hewcedariya mirovan dûr e. Di niqaşên zanyarî de, ji vî zimanê hanê re, zimanê artîfîsiyel dihê gotin. Bi gotineke din mirov dikare vî zimanî bişibîne zimanê çûkan, ango zimanê ku mirov jê fam nakin! Bi zimanê kurmancî jî, mirov dikare bibêje ku ev z i m a n t e l o m e l o y e , çelqomelqoye û bi hemû hawayên xwe rastiyên civatî dinûxûmîne.

Dîsa divê em hinek rastiyan li vir dubara bikin; rexne ne li ser zimanê nivîskiye, ji ber ku em jî nûha dinîvîsîn! Nivîsandin tişteke pîroz e. Lê rexne li ser zimanê ku ne realîst e, zimanê ku bi alîkariya normên ziman û bi alîkariya metodên felefeî rastiye vedîşere, zimanê ku

çêkiriye û ji bingêha xwe dûr ketiye.

Zimanê zargotinî di hemû waran de, ji hêla dîrokî de û ji hêla kulturî de bingêhe hemû babet çalakiyên zimanî ye, zimanê ku ji vî bingehî dûr bikeve, vî bingehî red bike, ji esil û fêslê xwe dûr dikeve. Ji ber vê yekê jî divê zimanê nivîskî û zargotinî alîkariya mirovan bikin ku, mirov x w e n a s b i k i n , m i r o v xwefambikin û mirov weke hebûn xwebilindbikin.

Zimanekî ku karibe alîkariya mirovan bike ku civata xwe, dîroka xwe, kultura xwe, dinyaya xwe û ramanên xwe baş fam bike, ew ziman di hemû waran de dibe azadîkar, rizgarîkar, serwext û ronahiye li derdora xwe direşîne, na, heger ev zimanê hanê van realîteyên ku min li jor jimartin binûxûmîne, veşere, girikî bike û di nava hevvelatiyan de perdeyên kulturî û sosyal ava bike, wê gavê ev ziman tadekare, berî hemû tiştan ew dibe alavê mirov perçiqandîne, dibe alavê desenformasyonê û ji hêla sosyal de jî dibe alîgir û di fonksiyona xwe ya civatî dibe hevalê serdastan...

Zimanê ku ez rexne dikim, ev zimanê hanê ye û divê zimanê edebiyata zargotinî jî di vê

kontekstê de bihê famkirin û xisûsiyetên wê di van waran de derkevin pêş. Zimanê edebiyata zargotinî û zimanê edebiyata nivîsandî weke dû zarokên cewî ne. Yek bi alîkariya yê din dikare baş bihê famkirin, ew bi hevdu re û di nava heman avaniyê de dibin xwedî wate. Ji ber wilo jî tiştên ku mirov ji bona edebiyata nivîsandî bibêje, di dawiya dawî de alîkariya mirovan dike ku mirov taybetiyên zimanê edebiyata zargotinî rast fam bike. Ango tiştên rast û çewt, tarî û ronahî, başî û xerabî, madî û manewî, formalî û naverokî bi hevdu re hene, û bi hevdu re dibin xwedî wate.

Ji ber vê rastiye, zimanê van herdu babetên edebiyatê, encex bi alîkariya hevdu dikare baş bihê famkirin. Ji ber ku yek bi yekî ye...

Beriya hemû tiştî divê mirov karibe vê rastiya hanê careke din dubara bike; zimanê edebiyata zargotinî, zimanê xelkê ye û ji nava kûraniya jiyana xelkê derketiye. Bersiva

hewcedariyê wana dide, zanebûna wana formule dike û zimanekî berbiçave. Ew ziman, bi tu haweyan ne zimanekî çêkiriye. Di navbêna mirovan û rastiye civatî de, ew, perdeyên ku agehdariyê dinixûmînin di mala xwe de danaliqîne! Rastiye, weke ku di civatê de heye, ji mirovan re vedigûhêze nava kesayetiya wana. Ji aliyê agehdarî de ne zimanekê valaye û ne jî zimanekê formel e, ew giraniya xwe bêtir dida ser naveroka ziman û hêlên zimên ku komûnîkatîfin derdixîne pêş. Ronîkirina mirovan ji vî zimanî re bingehê, di vir de teknolojiya ziman, ku gelek caran dikare bibe asteng li pêşiya zanîn û agehdariye, rola xwe ya sereke naleyîze. Teknolojiya ziman, di vê konteksta ku em li vê derê qal dikin, tenê dibe alîkarê aktorên serekî, lê ew çî cara nakeve şûna wan aktorên bi xwe. Ne xwediyê malê ye, lê di malê de paqîjiyê dike û gelek deveran li hundirê malê jî desenfekte dike!